



Australian Government



# Piştî vaksîna we a COVID-19 – AstraZeneca

Nûvekirina dawîn: 30 Tîrmeh 2021

## Derheqê vaksînê de

Te îroj vaksîna **COVID-19 AstraZeneca** wergirt.

Ev vaksîn dikare nexweşketina kesan bi COVID-19 berband bike. Di nav vaksîna AstraZeneca bo COVID-19 de çî vîrosa zindî SARS-CoV-2 tune (vîrosa dibe sedema COVID-19), û nikare COVID-19 bide te. Tê de kodeke (*genetic code*) bo beşekî grîng ji vîrosa SARS-CoV-2 ya wek protîna “*spike protein*” dihêt binavkirin heye, ku bi rêya vîroseke sermayê ya adetî û bêziyan (*an adenovirus*) digihê ‘xeliyyeyên’ te (*your cells*). Giyanê te (bedena te) bi encamê protîna “*spike*” çêdike û ji bo nasîna vîrosa SARS-CoV-2 û berxwedana li dij wê bi kar dihîne. Vîrosa bi navê “adenovirus” hatiye guherandin da ku xwe dubare neke dema digihê hindir ‘xeliyyeyan’ (*cells*). Yanê nikare derbas ‘xeliyyeyên’ din bibe û bibe sedema înfeksiyonê.

## Çi li dû vaksînkirinê dihêt çaverêkirin

Wekî her vaksînê re, heye ku hinek bandorên kêlekî (*side effects*) bo te hebin, li dû wergirtina Vaksîna COVID-19.

Hinek bandorên kêlekî yên **gelemper** li dû **vaksîna COVID-19 AstraZeneca**:

- êş, werem, hesasiyet (*tenderness*), sorbûna yan xurîna şûna derzîyê
- westabûn
- serêşî
- êşa tamaran
- hestkirina wekî mirov dike vereşe
- tagirtin û serbûyîn
- xwe nexwesh-hestkirin
- êşa mofirkan/enîşkan.

Di nav bandorên **kêmtir gelemper** de li dû vaksîna **COVID-19 AstraZeneca** ev hene:

- werimandina gozikên hindir gewrîyê (*enlarged lymph nodes*)
- êşa piyan yan çaqan
- gêjbûn
- kêmbûna meraqa li xwarinê

[health.gov.au/covid19-vaccines-languages](https://health.gov.au/covid19-vaccines-languages)

After your AstraZeneca COVID-19 Vaccination - 14082021 - Kurdish Kurmanji

- zikêşî.

Van bandorên kêlekî adeten sivik. Pirraniya caran di nav rojekê yan du rojan de diçin. Van bandorên beralî bi awakî gelemper sivikin û di nav rojek an du rojan wê derbas bibin.

Hinek kes wê tecrûbên wek semtomên giran wek-grîp/sermagirtin ji ber egera vakîsinê bigrî bi gorî ew vakîsinên heyîn ên hêmper, pêka ne kû pêwistîyek kû ew ji wan çalekîyên xwe ên normal bo demekî dûr bimînin. Ev semptom/îşaret zêdetir tene dîtin piştî an berî herû dozên derzîyan peyda bibe bi geleverî wê piştî doz/derzîya yekemin bêfir xwîya bet.

Ger şûna derzîyê biêşe yan li dû vaksînkirinê bi tayê kevî, serê te yan bedena te biêşe, dikarî dermanên bi navê “paracetamol” yan “ibuprofen” bi kar wîni. Ew hinekî ji êşê dadixin. Pêdivî bi karhanîna “paracetamol” yan “ibuprofen” pêş vaksînkirinê tune. Ger şûna derzîyê biwerime tiştekî sar bide ser.

Bandorên kêlekî yê **kêmjimar** ku li dû vaksîna **COVID-19 AstraZeneca** hatine ragîhandin:

- reaksiyona hesasiyetê (alerjîyê) ya ziyade (*anaphylaxis*).
  - Ev ji milyonek 1 kes bişî kû vaksînê li xwe dixin bi wanre peyda.
- Rewşek bi nave tromboza bi sendroma trombokitopenîya (TTS), ku tevlihevûna xwînê (tromboz) û astên trombokitopeniya kêm e:
  - Agahdarîyên li der û ên ji Avustralîya dîyardikin kû TTS rewşek kêm têye dîtin
  - Pêlên tevli hevûyîn axwînê dikarin li ser deverên cûda yê li ser laş pêk wrin, di navde jî ( kû ji vê re tromboza sinusê a reh mêjî tê gotin) û li weha ser zik. (ji vê re tromboza reha organên hindirîn – splanç îdîopatîk tê gotin). Kêmasîya niqra platelets ango temzîkan dikare bibe egera xwînherrikî ye.
  - Semtomên vê ango nîşan vê di pranî rewşande di navbeyna 4 ê 42 piştî vaskîne dest pêdik e.
  - Kesên bi vê rewşa hanê pir nebaş ango nexeş dikevin hewceye biçnin nexweşxanê. Ev rewşa han dkare bibe sedema seqetîyek demdirêj, û heta mirinê jî.
  - Bo agahdarîya zêde di derheqa TTS hun dikarin ji – Li ser [pelê agahdarîya nexweş a li ser vaksîna AstraZeneca COVID-19 û TTS](#) bi dest bixin.

**Baştir e alîkariya pijîşkî li dû vaksînkirinê bixwazî, ger:**

- weha bawer î reaksiyona hesasiyetê (alerjîyê) bi te re cîh digirêye. Telefona 000 bike ger şanên giran hest bikî, wek diwariya nefsgirtinê, xîzîniya sepetê, bezabûna nefesê, yan bêtaqetîya tevahî.
- bandoreke vaksîne ya tu li bendê bûyî xuya kir, ku li dû çend rojan neçû.
- Ku ev semptomên/îşaretên li jêrdîyarî bi were hebin, bi taybetî 4 heya 42 rojan piştî vaksîlêdanên:
  - Serêşîyek berdewamî piştî vaksîlêdanê ku ji 48 kadjimêran ji derbas bû, an ji piştî vaksîlêdanê 48 kadjimêran derentir îşaretên wê hatin dîyarbûyîn. Dibe di despêkêda dermanên êşkûjê êşê kêm bike, lê belê ku her berdewam kir
  - tarîbûyîna li ser nezerê/dîtinê
  - bêtaqetîya li ser rû û dest û milan
  - şaşmayîn an ketîna ji nişka.
  - kêmasîya nefesê/pîhnê
  - êşa li ser sing
  - êşek berdewamî a ser zik
  - wermîmandin a li ser ling
  - birin a pizrikê hûr an everê sorbûhî ên ne li deverên cîhê vaksîn lêketî û belesebem.

Bi dikorê xwere pişterast bike kû te berî demekî vaksîn li xwe da ye. Bo şanên ku ne acil in, dikarî bi alîyên pijîşkî yê adetyî (doktorê xwe bo nimûne) bişewirî.

## Tehqîbkirina ewlehiya vaksînê û ragîhandina bandorên kêlekî

Dikarî bandorên kêlekî yê derheqê wan de bi guman î bo alîyê vaksîn daye te yan alîyekî din yê pijîşkî ragihînî. Ew ê bi encamê raporteke fermî bi navê te bo dezgeha tenduristî ya herêma te, yan rasterast bo Dezgeha Serpereştiya Dermanan (TGA), pêşkêş bikin.

Ger baştir dibînî bi xwe raportê amade bikî, serî li vê malperê xe (di nav malpera TGA de ye): <https://www.tga.gov.au/reporting-suspected-side-effects-associated-covid-19-vaccine> û rêberiyên li ser rûpelê bişopîne.

## Têstkirina bo COVID-19 li dû vaksînkirinê

Hinek ji bandorên kêlekî yê vaksîna bo COVID-19 heye ku wek yê COVID-19 bin (bo nimûne, tagirtin). Lê di vaksîna AstraZeneca bo COVID-19 de çî vîrosa SARS-CoV-2 ya zindî tune û nikare bibe sedema çîhgirtina COVID-19. Heye ku pêdiviya te bi têstkirineke bo COVID-19 yan bi îzolekirinê nebe:

- ger şanên wek tagirtinê, serêşiyê, yan westabûnê di nav du rojên li dû vaksînkirinê de bi te re xuya bibin, û
- ger baş bizanî ku çî kêşeyên bi nefesgirtinê re peywendîgir (wek avahatina ji poz, kuxînê, êşa gewrîyê, wendakirina hestê bêhnkirinê yan tamkirinê bi te re tunene.

Lê baştir e tu rêberiyên herî dawîn yê li herêma xwe bişopînî. Heye ku van şîretan werin guhertin, ger COVID-19 li herêma te belav bibe. Heye ku pêdiviya te bi têstkirina bo COVID-19 hebe, ger mercên din cîh bigirin, wek nêzîkbûna te ji kesekî ku hebûna COVID-19 pê re îspat bûye. Ger bi guman î, lêniherîna pijîşkî bi dest xe.

## Hevtîna xwe ya duwemîn bi bîr bînin

Grîng e vaksîna AstraZeneca bo COVID-19 du caran bi dest xî, dora 12 hefte di navbera wan de. Kurtkirina di navera 12 heya 4 hefteyan a di navbeyna herdû dozan de dibe ku di hinek mercan de wê di cîhda be. Wê doza duyemîn wê parstina paştir li dij COVID-19 pêk bîn e.

## Agahiyên dema hevdîtinê didî çawa dihên bikarhanîn

Bo agihiyên ka taybetmendiyên te yê şexsî çawa dihên komkirin, hêlandin û bikarhanîn, serî li vê malperê xe: <https://www.health.gov.au/using-our-websites/privacy/privacy-notice-for-covid-19-vaccinations>